

## Peyama entîmirovatiyê

### „Peyamî komelêk nûser û edîb û ekadîmîstî kurd“

Bo her kurdekê / kurdekî

Liser vê „peyam“ê ta niha çend bend ji aliyê kurdine dilsoz de (bi kurmancî û bi soranî) hatine belavkirin. Ez bawerdikim ew nivîsarina her destpêk in, lewma piştî belavkirina vê „bobelatpeyamê“ guhartinine mezin wê di warên **filosofî, neteweyî, siyasî, civakî, çandî û lîtêretûrî de di nav kurdan de peyda bibin**. Ne cara yekemîn e êrişên wena têne ser zimanê kurmancî; lê ev **tepela êrişa** ye, lema jî encamên wê dê pir tirsnaq bin!

Ez wek kurdekî sade ji her hevvelatiyekî xweye birûmet dixwazim û bi taybetî ji kurmancnivîsevanan ku di nivîsên xwe de bi şewakî giştî hemî soranan nekin gunehkar bi bûneya wê belgehê; ew ne karekî mirovatî rewa ye û ne jî rast e ji aliyê zanistî de; jiber wê ve ta niha 53-ê kes berpirsyar in. Dema nîrînên Tewfîq Wehbî (1892-1984) yê entîkurmancî ji zû de çalbûye, diyar e ew kesina hîn di serdema mîrnîşîna Baban de dijîn.

Ez pêşniyazên wan kesan werdigerînim kurmancî, ta piraniya xwendevanan aşnayî naveroka wê bibin û navên îmzekiriyên jî raberdikim. Peyamnivîsan belgeha xwe ji berpirs û dezgehine fermî ya Herêma Kurdistanê re şandine; pêşniyazên wan ev in:

**Yekemîn:** Bi qanûnekê biryar bê dandin ku zaravê kurmanciya navîn (soranî H.H.) bifermî bibe bingehe wek zimanekî standard bo xwandin, bo karûbarên dezgehên hukûmetê û herweha ligor wê qanûnê jî divê şagirt û xwandevan pê bêne erk kirin (illekirin, îlزامkirin) ku ew di pirogiramên (zimanê kurdî) de hemî zaravayên dine zimanê xweyê kurdî zanibin jiboku ew cûrezaravên cuda jihevdi bêne nêzik kirin.

**Duhemîn:** Qanûneke din (hawpêç, murfeq) bi ya yekemîn re bê danîn ku ew avakirina înstîtûtekî neteweyî yan zanîngehekê ku karên zanistî spardeyî wê bibe, daku ew bi vekolîn, zelalkirin û erşivkirina hemî cûrezaravên zimanê kurdî rabe û biberdewamî pêşniyazan pêşkêş bike bo geşkirina zimanê fremî (soranî H.H.) bi peyv û bi bêjehevgrirtinan ji hemî cûrezaravên din.

15.04.2004

### Navnîşa daxwazkerên „Peyamê“

Ez pir xemgîn im ku navê hin kesan di nav vê lîsteyê de dibînim; min tucaran rayên weha ji wan ne bihîstibûn û ne jî di berhemên wan de xwandibûn, lê eger ew dixwazin liser vê rêyê biçin, ew karê wan e. Divê danûstandin ligel vê navnîşeyê bê kirin çawa navnîşeyeke tawanbariya entîmirovatiyê; ew li hemî rêxistinên pîşeyî kurdî û navneteweyî xasma li navendên PEN International bêne belavkirin. Wezîrê wan yê pêşniyazên qedexekirina zimanê kurmancî dide li Den Haagê bê dadgehkirin. Eger berpirsyarên Herêma Kurdistanê pêşniyazên peyamîmzekiriyên bipejirînin, wê çaxê em hemî kurdistanîyên kurmancîaxiv destên xwe ji wê dişon.

1. Aram Kakey Felah 2. Aram Rif'iet 3. Arêz Simko Husên 4. Azad Berzincî 5. Azad Subhî 6. Asos Herdî 7. Ehmed Mîre 8. Dr. Elbêrt Isa 9. Dr. Enwer Qadir Caf 10. Enwerî Reşî Ewlla 11. Bextiyar Elî 12. Bextiyar Kerîm 13. Taban Kemal Elî 14. Tarîq Fatîh 15. Cemal Ebdul 16. Çoman Herdî 17. Husên Arif 18. Daray Mehamî 19. Dana Reûf 20. Dillşad Heme 21. Raber Fayeç 22. Dr. Refîq Sabîr 23. Reûf Bêgerd 24. Rêbwar Sîweylî 25. Rêbîn Ehmed Herdî 26. Dr. Rênwar Rêbîn (Dr. Piştîwan Ebdulla) 27. Serbest Resûl 28. Sellah Ehmed 29. Dr. Şaho

Seîd 30. Şiwan Ehmed 31. Şêrzad Hesên 32. Şêrko Bêkes 33. Şêrko Kirmanc 34. Ebid Arif 35. Eta Mihemed 36. Ednan Osman 37. Dr. Ferîdun Ebdul Berzincî 38. Fetah Zaxoyî 39. Dr. Fûad Heme Xurşîd 40. Karwan Kake Sor 41. Kamyar Sabîr 42. Dr. Kemal Mirawdelî 43. Goran Ebdulla 44. Mihemed Heme Baqî 45. Mihemed Qadir Yunis 46. Dr. Mihemed Kemal 47. Dr. Mihemed Reûf Seîd 48. Merîwan Wirya Qanî 49. Newzad Ehmed Eswed 50. Hendirên 51. Helkewt Ebdulla 52. Dr. Hogir Mehmûd Ferec 53. Hîwa Qadir.

### Çend dîtinên bilez liser „Peyamê“

Mafê herkesî heye bi zimanê xwe bixwîne û derbirînên xwe pê biçêlîne; ev mafekî surîştî mirovatî ye. Kî li dijî vê rastiyê derkeve û zimanekî qedexebike ew dikeve xaneyê entîmîrovatiyê. Rabûnûrûniştina kurdan bi sê zaravên serekîn (kurmancî, soranî û zazakî) tê raberkirin, ev jî rastîyek e. Niha ne dema standardkirina zimanê netewî kurdî ye, ji xwe berê du „zimanên“ me yê standard hene, ew yeka jî ne şermezariyek e, bi vajayî wê, di mercên hevde de ew dewlemendiyek e.

Ji rêxistinên kurdistanî yê gaveke rast di wê babetê de avêtine berpirsyarên kenala têlêvîzyonî RojTV û xwîşkên wê berî wê ne, wan rê dane – tevî ku mebesta wane serekîn îdyologî-siyasî ye, lê helwest rast e - hemî zaravên kurdî pirogiramên xwe belavbikin û mera hestdike ku giyanê kurdistanî, giştanî peydadibe û bi wê bûneyê spasdarî ji wan re. Lê mixabin di pirsê makanî kurdistanî de hîn rêxistinên siyasî kurdî ji tiradîsyonên tengramaniyê bi dûr neketine; ew jî taybetvaniya nasûta kurda ye ku têkoşînê dikin bo serneketinê.

Ev pîlan, pêşniyaz, konfiransên li herêma Kurdisrana Başûrê bûne û dibin, tenê arîşeyan ji zimên re peydadikin û pêxamên wan çalakiyan pir binêgetîvî li tevahiya Kurdistanê belavdibin.

Her zimanekî neteweyî jî çawa vekolînên zanistî dinumînin ku ew ne zimanekî **monosystem** (yeksîstêm) e, lê zimanekî **polysystem** pirsîstêm) e... her zimanekî standard yan zimanekî gelemper, ger bitêrcûreyî bi hev ve hatiye bestin di bin bandora van hêmanan de ye:

- Guhartinên herêmî (zarav, devok),
- Guhartinên civakî (**Soziolekt**: bikaranîna zimanekî ya komeke civakî, wek zimanê pîşeyî, komên zimanan),
- Guhartinên fonksiyonel (zimanê pisporî),
- Guhartinên îndîvîduel (Idiolekt: awayê axaftina mirovekî). (Gerhart Wolff, Deutsche Sprachgeschichte von den Anfängen bis zur Gegenwart, Tübingen 2004).

Ez ji wan berêz doktorên ew peymanî înzekirine dipirsim, liser çî bîngêhên zanistî hûn dixwazin zimanê babaniyan bikotekî liser hemî kurdên li Başûrê Kurdistanê dijîn belavbikin? Bo çî dewlemendiya zaravên kurmancî, hewramî, feylî û devokên li navçeyên din bêne qedexê û erşîfkirin? Kanî zimanzanên we liser tanga cîhanê, ku bîngêhine teorî nû liser zimên danabin? Kanî ferhenga we ya yekbûyî, rêkûpêk bi kêmanî liser zimanê baban? Kî ji we bi zimanê kurmancî dixwîne, ku zanibe tanga wîye îroyî çî ye? Kî ji we kane di nihênîyên zimanê kurmancî keve û aliyên wîye sêmantîkî, îdyomî û êstêtikî ji me re bibêje? De fermûn em li benda bersivên we ne; lê bersiva we aşkere ye; ew enfalkirin û bikomel bizîndî çalkirina zimanê kurmancî ye, ev jî komkujî ye!! Seddam Husseyn bi hemî hovîtiya xwe fermana qedexekirina zimanê kurmancî dernexist.**Pîrozbe li we û li alîgirên we ev destketina!! We Seddam li şûna xwe hêştîye!!**

We ji me kurdan re rêya tevkarîyê ne hêşt, lema jî em nçar in, bibêjin:

Hûn li Babanistana xwe

Em li Kurdistana xwe.

Bonn 27.04.2008